

# Ewlehiya beravê ji malê de dest pê dike

## 1

### Beraveke ewle hilbijêrin...

**Programa Beachsafe daxînin**



**Gelo îro rizgarkerek li ber beravê heye?**

Divê hûn neçin ber beraveke bê rizgarkar be ji ber ku kes tune ku we biparêze heke hûn bikevin tengasiyê.



**Berav vekirî ye an girtî ye?**

Eger beravek girtî be, ev tê wê wateyê ku pir xeternak e ku mirov di nav avê de be - divê hun ji beravên girtî xwe dûr bikin.



**Çi xeter li ber beravê hene?**

Di xetereyê de dibe ku herîk, heywanên deryayî yên mîna mîşên şîn yên mezin an jî pêlên mezin hene.



**Tav çiqas xurt e?**

Tava Australya pir bihêz e, ji bîr nekin ku hûn rêja UV kontrol bikin û bi dirêjîya rojê gelek biçin ber sîhê û avê vexwen.



## 2 Tiştên xwe kome ser hev bikin da ku we li ber beravê biparêzin

**Kirêma tavê, kum û cilên mil dirêj**

- Berî hun derkevin herî kêr 30 deqeyan divê tûşî kirêma tavê bibin.
- Bi taybetî eger di nava avê de bî, divê di tevahiya rojê de bi rêk û pêk kirêma tavê ji nû ve were bicîhkirin.




**Cilên melevaniyê**

- Bi cilûbergên normal melevaniyê nekin ji ber ku dibe avgir be (tîjî av bibn) û pir giran bibe ku mirov di nav avê de biserkeve, melevaniyê bike an jî raweste.
- Ji bo cilên melevaniyê gelek vebijarkên ewle hene, di nav de burkinî ku hemû laş digire.



**Amûrên ewlehiyê ji masî girtina di nav keviran de**

- Eger hûn dixwazin biçin masîvaniya di nav keviran de, pê ewle bin ku hûn li gorî rêzikan bin, bi awayekî gunçaw cilên xwe li xwe bikin û alavên ewlehiyê yên rast li gel xwe bikin.
- Çakêtên parastinê dema masîgiriya keviran hukim e û cezayê nêçîrê ji bo lixwenekirina wan derbas dibe.
- Teqes bikin ku hûn dizanin ka meriv çawa çakêtê parastinê binepixinê - gelek fetisîn çêdibin ji ber ku mirov nizane alavên ewlehiya çawa bikar bînin.



**Alkolê dernexê**

- Teqes bikin ku we gelek av heye ku hûn têr av bin.
- Ji alkolê dûr bisekinin dema ku li ber beravê bin, ji ber ku ew dikare bi awayekî zelal bike tu baş nefikirin û biryareke rast nedin.
- Alkol dema rêaksiyona we kêr dibe û dema ku di nav avê de ye, derfetên xwe yên tengasiyê zêde dike.



# Dema hun li ber beravê bin çawa di ewlehiyê de bimînin...

## Her tim di navbera alên sor û zer de melevaniyê bikin

Rizgarker alayên di cihên melevanî ewle be bi cîh dîkin û ew ê li vê herêmê çavdêriyê bikin û dê bibînin ka hewceya we ya alîkariyê heye.



## Li nîşanên ewlehiya beravê binêrin

Lifesavers nîşanên li ser bejahiyê cih dîkin da ku hûn xetereyên ku hebin bizanibin - berî ku hûn biçin avê li van nîşanan binêrin.



## Silavê bide rizgarkeran

Gava hûn digihîjin beravê herin silavê bidin rizgarkeran - ew ji bo alîkariyê li wir in û ew hez dîkin ku kesên nû bibînin û bersiva her pirsêke we bidin.



## Ti carî bi tena serê xwe melevanî nekin

Her tim bi hevarekî an jî bi mezinekî re melevaniyê bikin û qet bi xwe nekevin nava avê.



## Eger di nava avê de hun bikevin tengasiyê, aram bin û destê xwe bilind bikin

Dema di okyanûsê de ku hun nikarin dest li jêrê bidin, dibe ku bi bitirs be, lê ji bîr nekin ku bêdeng bimînin û destê xwe ji bo alîkariyê bilind bikin.

Hewl bidin ku biavêjin û heke hûn hîs dîkin ku hûn ji peravê têne vekişandin ji ber ku hûn hewl didin ku li dijî heyf avbikin - ev ê tenê we westiyayî bike û nekarin li ser avê bimînin.



## Di rewşa awarte de – telefoni 000 bikin


Eger hun nikarin melevaniyê bikin, hewl nedin ku kesên din ên ku di tengasiyê de ne rizgar bikin - her dem alîkariyê bistînin - eger rizgarek tune be telefoni 000 bikin.

Hun dikarin alîkariya kesekî bikin ku tiştê bavêjin ku mîna panelê an qutiyek sar bigire. Li dora xwe binêrin, li gelek beravan cîhazên sor ên seravkirinê hene ku ji bo bikaranîna giştî hatine saz kirin.



## Rizgarker ne pitikker in

Rizgarker ji bo alîkariyê li wir in lê ew ne pitikker in û divê zarok ti carî bi tenê li ser qûmê yan jî di nava avê de bêyî mezinan li wan temaşe bikin, bên hiştin.



## Tu çiqas berav ewle yî?

Biceribînin û bibînin ku hun çiqas dîzanin ku hun li ber beravê di ewlehiyê de bimînin. [Li vir bitikînin.](#)

